

FONETİKA DEVOKA SEMSÛRÊ

Şerif GÜZEL* û Zafer ATLI

Zanîngeha Bîngolê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî - (serifguzel@bingol.edu.tr)

Wergirtin: 11. 2017 / Pesendkirin: 03. 2018 / Belavkirin: 03. 2018

<https://doi.org/10.26436/2018.6.1.559>

KURTÎYA LÊKOLÎNÊ:

Ev xebat hewl dide ku taybetiyên devoka Semsûrê wek cudahiya dangan, guherînên tîpan, nişan bide. Her wiha em ê hewl bidin bê ka gelo devoka Semsûrê çi taybetiyên xwe hene. Lewra devoka Semsûrê ji aliyê erdnîgariyê ve li rojavayê Kurdistanê Bakur dimîne, wate ji navenda herêmên kurmançîxêvê dûr e. Di vê xebatê de me armanc kiriye ku em taybetiya devoka Semsûrê biderînin, di axaftinê de dengên ku ketine yên ku veguherîne dengêkî din an jî dengên taybet yên tenê li Semsûrê tên bikaranîn tespît bikin. Ji bo vê xebatê me mînakên xwe ji çend kesên ku li Semsûrê dijîn wergirtin. Paşê ji van mînakên, me taybetiyên dangan (çi dengdêr çi dengdar) li gorî rêza alfabetîk senifand. Ji bilî van taybetmendiyên qertafên zayendê, bikaranîna hoker û daçekan, kurtkirina dangan û hwd jî dê were tespît kirin. Bi vî awayî em dixwazin derxin holê ku bê ka taybetiyên devoka Semsûrê ji aliyê fonetîkê ve çi cihêrengî û cîyawaziyên di xwe de dihevin. Spas ji Îslîm Doxanê re ku ew xwendekara me ye, di tomarkirina dangan de alîkariyê mezin da me.

Bêjeyên Sereke: Fonetîk, Semsûr, Devok, Kurmançiya Bakur, Deng.

1. DESTPÊK

Yek ji şaxên zimannasiyê jî fonetîk e ku li ser dangan radiweste. Peyva fonetîkê ji phoneya Yewnani hatiye dariştin ku wateya wê deng e. Her wiha bêjeya fonetîkos ku wateya xwe “ya ku tê bihîstin e” pênaseya fonetîkê ji aliyê şikl û wateyê ve dide ber çavan. Wek şaxek ji şaxên zimannasiyê fonoloji li ser dengên zimanê radiweste da ku hêmanên dengên wî zimanî di gel taybetiyên xwe biderîne û nişan bide. Guherîn û ketina dangan di devokê de taybetiya wê nişanî me dide. Di her zimanî de devok peyda dibin. Nexasim zimanêke mîna kurdî ku ji ber sedemên wek derengdestpêkirin an derenghiştina nivîsê ji bo hemû kurdan, erdnîgariya Kurdistanê, rewşên siyasî û hwd devokên cuda cuda li ser axa welêt peyda bûne. Yek ji van devokan jî devoka Semsûrê ye ku li rojhilata Kurdistanê Tirkîyê ye; li rojhilat, bakur û başûrê vî bajarî û navçeyên wê yên heman hêlê zazakîxêvê û kurmançîxêvê qismek jî tirkîxêvê hene, li rojavayê wê jî kurmançîxêvê û tirkîxêvê hene.

Semsûr bajarekî qedîm e ku dîroka wê digihê 40000 sal B.Z. Ji wê demê heta dema me herêma Semsûrê li gorî agahiyên di destan de ketiye bin desthilatdariya dewletên wek Hîtû, Mîtannî, Frîg, Asûr, Pers, Komagene, Roma, Emewî, Abbasî, Selçûk, Osmanîyan û hwd.

(<http://www.adiyaman.gov.tr/adiyaman-tarihi>) Niha jî wek bajar li başûrrojhilata Enedolê dikeve. Li bakurê vî bajarî Meletî heye ku bi çiyayên xwe ve xetê dagirtiye. Navçeyên Meletî yên li vî hêlê ne ev in: Çirmîk (Yeşilyurt), Şîro (Puturge), Wêranşar (Doxanşehir). Li rojava navçeya Mereşê Pazarcix; li başûrrojava navçeya Dilokê Ereban; li başûrrojhilat navçeyên Rihayê Girê Sor/Sêwreg (Siverek), Curnê Reş (Hilvan), Heweng (Bozova) û Xelfetî (Halfetî); li rojhilatê jî Çêrmûg (Çermik) û Şankuş (Çunguş) du navçeyên Amedê hene. Ji van bajar û bajarokan Sêwreg, Çêrmûg û Şankuş kurdên zaza ne yên din jî kurdên kurmac in. Li gorî hejmara 2016an nufûsa Semsûrê 437015 e (<http://www.adiyaman.gov.tr/nufus-bilgileri>). Herêma Semsûrê ji ber rewşa xwe ya jeostratejîk bûye qonaxa gelek netew û dewletan. Ji ber vê yekê hem ji aliyê temasên neteweyî hem jî ji aliyê zimanên van neteweyan, hem jî dîrbûna wê ji navenda diyalektên kurdî li ser zimên bandoreke mezin peyda kiriye.

Di vê xebatê de em ê hewl bidin bê ka tesîreke çawa li ser devoka Semsûrê peyda bûye. Lê belê mijara me tenê fonetîka

devoka Semsûrê ye. Ji ber vê hindê em ê xebata xwe li ser guherînên dangan, şikl û rengên peyvên, tîpên li zimên zêde an kêr bûne bîşnor bikin. Bo vê yekê jî qeydên me zêdetir ji navenda Semsûrê an jî ji gundên girêdayî navendê hatine girtin. Me navên kesên yên ku dengên wan hatine girtin digel temenê wan li jêrê rêz kiriye. Her mîna ke me ji kîjan qeydê hatibe girtin li kêleka wê navê qeydê dê bê nivîsîn.

- T. 1 (Tomar 1), Tayyar DOĞAN, Semsûr, 50, Dêwê heft serî
- T. 2 (Tomar 2), Tayyar DOĞAN, Semsûr, 50, Dêwê heft serî
- T. 3 (Tomar 3), Tayyar DOĞAN, Semsûr, 50, Dêwê heft serî
- T. 4 (Tomar 4), Saîme OKUTAN, Balyan (Yaylakonak), 55, Çangal qiz
- T. 5 (Tomar 5), Saîme OKUTAN, Balyan (Yaylakonak), 55, Çangal qiz
- T. 6 (Tomar 6), Saîme OKUTAN, Balyan (Yaylakonak), 55, Zavayê Mar
- T. 7 (Tomar 7), Saîme OKUTAN, Balyan (Yaylakonak), 55, Zavayê Mar
- T. 8 (Tomar 8), Ji Civata malbata Kek Tayyar
- T. 9 (Tomar 9), Fatma DOĞAN, Semsûr, 52,
- T. 10 (Tomar 10), Ji Civata malbata Kek Tayyar
- T. 11 (Tomar 11), Tayyar DOĞAN, Semsûr, 50, Şêr û Şepal
- T. 12 (Tomar 12), Fatma DOĞAN, Semsûr, 52, Hevhinarkê
- T. 13 (Tomar 13), Fatma DOĞAN, Semsûr, 52, Lerza Pismam

2. TAYBETMENDIYÊN DENGNASIYÊ

2.1. Tîpên Dengdêr/Vowel (Bideng/Bizwên)

Di alfabe ya Kurdî (Kurmançî) de 8 tîpên dengdêr hene. Ev herf li gorî dengdêrên kurt û dirêj wek du senifandinên sereke bi vî şiklî ne; dengdêrên kurt (e, i, u) yên dirêj (a, ê, î, o, û). Li gorî cîderkê; dengdêrên pêşderkî (î, ê, e), dengdêrên navderkî (i, u), dengdêrên paşderkî (û, o, a) ne. Li gorî awayê vebûna devê mirov; dengdêrên gilover (o, u, û), dengdêrên nîvgirtî (î, i, ê), dengdêrên vekirî (a, e) ne. Li gorî asta derketinê jî dengdêrên bilind (î, û, i, u), dengdêrên navincî (ê, o), dengdêrên nizm (a, e) ne (Bedirxan-Lescot, 2013: 8; Tan, 2015: 38). Wek tabloyekê hemû dengdêr bi vî şiklî dê bastir bên dîtin.

	dirêj	kurt
	pêşderkî	paşderkî
bilind	î	û
navincî	ê	i, u
nizm	a, o	e

* Vekulerê berprş

2.1.1.1. Guherîna Dengdêran

2.1.1.1.1. Guherîna a > i an a > o: Tîpa -a yê di fonetîkê de dengdêreke dirêj û paşderkî ye. Di heman cihî de herfa -o yê jî heye. Ji ber vê yekê herfa -a yê zêdetir bi -o yê dikeve nav guherînekê. Di devoka Semsûrê de jî dengdêran tîpa bi eşkere xwe nişan dide yek jê jî tîpa -a yê ye. Divê bê zanîn ku dengê di navbera -a û -o yê de jî hatiye tespîtîkirin.

Di devoka Semsûrê de jî em dibînin ku tîpa -a yê zêdetir di kîteya yekem de diguhere berev bi tîpa -o yê. Di kîteya duyem de jî ev mînak tên dîtin lê di kîteya sêyem de nehatin tespîtîkirin.

Çend mînak:

Non “nan” (T4), bibori “bibare”(T4), bonê kirine “bangê kirine”(T4), sondix “sandi/sindoq”(T4), mol “mal”(T5), ovêtiye “avêtiye”(T5), lovik “lawik”(T5), con “can”(T6), lowik “lawik”(T11), most “mast”(T12)

Her wiha em dikarin bi rahetî biêjin ku piştî tîpa -b yê heke -a hatibe hemû bûne -o an jî dengê di navbera -a û -o yê de.

Ji bo a > i yê me di tomarên xwe de zêde mînak nedîtin lê ev cure zêdetir heke berî gihaneka -kuyê tîpa -ayê hebe peyv xwe bi gihnekê re dizeliqîne û vediguhere berew -iyê. Wek: Manî’k “mana ku”(T2)

2.1.1.1.2. Guherîna e > i an ê > î: Di qertafa zayendê de ku ya nêr û yekjimar -ê ye diguhere bi -iyê.

Mînak: Bovi wan “bavê wan”(T3), binî bîrê “binê bîrê”(T2), peyî xa “peyê xwe”(T7), welatî bav dê xu “welatê bav û diya xwe”(T11), benî xa “benê xwe”(T11)

Her wiha -eya dawî jî ku zêdetir em di kêşana lêkeran de li rastî wê hatin dibe -î. Ev guherîn jî di cinavka kesandinê ya pirjimar a sêyem de xwe nişan dide.

Wek mînak: bira nî “bira ne”(T1), bipênî “bipêne”(T1), em kose nî “em kose ne”(T3).

2.1.1.1.3. Guherîna e > i: Herfa -eyê di gelek cihan de wek -iyê telafûz dibe.

WEK mînak: hasin “hesin” (T6), pîrik “pîrek”(T7), çî yi “çî ye”(T7), çiftik “çifteke”(T7), çindî camêr “çendî camêr”(T7), bigiri “bigire”(T7), sikinî “sekinî”(T10), ne bacanik ne îsotik “ne bacanek, ne îsotek”(T12)

Di qertafa nebinavkirinê -ek de jî -eya berî -kyê dibe -i: beranikî “beranekî”(T2), sevik “sêvek” (T4), avik “avek”(T5), jinik pêrî “jineke pêrî”(T5)

Her wiha di çend mînakên cuda de de jî em li rastî vê guherînê hatin: çî heyî çî tine yi “çî heyê çî tune ye” (T1, T2, T3, T4...). Dîsa peyva çerê ku di wateya çawayê de ye, li hin herêman(bakurê Çewlîgê, Meletî, Semsûr, Riha) wek -çer tê bilêvkirin lê di vê devokê de mîna -çir jî telafûza wê hatiye selimandin.

2.1.1.1.4. Guherîna e > ê: Ev cure guherîn jî em dikarin bibêjin ku di dawîya peyvên de zêdetir li kar e. Wek mînak: Dixwê “dixwe”(T1), Rowiyê “rabûye” (T6), çûyê “çûye” (T6), dên neke “deng neke”(T7), te werê “tev were”(T12)

2.1.1.1.5. Guherîna ê > i: Ya rast me pê baş dernexist ku ev -diya ku tê bilêvkirin ji ku hatiye pê. Lewra em nikarin bibêjin ku qertafa dema niha ye. Ji ber ku hem -diya ku qertafa dema niha ye hem jî -biya ku qertafa dema bê, raweya fermanî an jî xwestekî ye, bi hev re li lêkerekê bar nabin. Li gorî qenaeta me ev ya ji tiştê guherîye bûye ti > di an jî ji qertafa dema bê -dêyê guherîye. Ev ihtîmala dawî nêzîktir xuya dike. Lewma me li gorî wê guherîna denga senifand. Wek mînak: Em çî di bikinê “Em çî dê bikin”(T1), çî di bixwim “çî dê bixwim”(T3).

Ji bilî vê di vê mînakê de jî behsa heman guherînê dikare bê kirin: xwengi hev “xwengên hev”(T4)

2.1.1.1.6. Guherîna û > ü an jî o > ö: Şûnê xwe “şûna xwe”(T1). Di vê mînakê de du guherîn hene; yek jê zayenda mê ye ku bi -ayê tê nişandan, li vir dewsa xwe daye tîpa -êyê, ya din jî -û ye ku bi tîpa -ü veguherîye. Her çend ev tîp di alfabe ya kurdî de tunebe jî di devoka Semsûrê de hatiye tespîtîkirin. Asas ev tîp li herêma wek Botan û Badînanê jî di axaftinê de xwe nişan dide lê di alfabe yê de jî xwe re cih nediye. Akdag(2017: 105) vê cudatiyê wek taybetiyeke bingeh dibîne û wiha diajo: “Di

kurmanciya herêma Semsûrê de jî aliye denganiyê ve cudatiya bingehîn hebûna /w/ yê anku /ü/ ya tirkî ye. Li şûna /ü/ yê bi gelemperî dengê /û/ tê bikaranîn.” Mînakên xwe jî wiha dide:

Li Semsûrê	Zimanê Nivîskî
Bük	bûk
Bün	bün
Çün	çün
Tür	tür
Güz	güz

...

Heman mînak em di xebata Ebdurehman Ehmed(2017: 15) de jî dibînin ku ew jî jî Refîq Şiwanê veguhariyê dide: “Zarî lorîş wek şewezarî badîni diftongî -ü heye û zor bekar dêt. Beşîkî zor le dengî (-ü -و) debîn be -ü. Wek:

Bû > bü, dü > dü, çün > çü

Her wiha kür “kor”(T11) jî bi dengê -ü yê tê telafûzkirin. Em jî sedî sed nikarin bibêjin ku ev deng ne aîdî kurdî ye an li ser tesîra tirkî ev deng derketiye. Lewra heke tesîr ji hêla ciranbûn û dûrbûna ji navenda kurdîxêvan be wê demê herêma Botan û badînanê dê çawa bê şîrovekirin. Divê lêkolînê hê zêdetir be li ser denganiya kurdî.

2.1.1.7. Guherîna o > i: Tomarên di destê me de jî bo vê babetê tenê ev mînak hat dîtin. Lê gelek caran dubare dibe û di tu cihî de cot nayê bilêvkirin. Ji ber vê yekê jî me divêti di mînakdayîna wê de dît. Cit “cot”(T3)

2.1.1.8. Guherîna û > o > w: Di gihaneka -ûyê de mirov dikare behsa vê guherînê bike. xwar o cardî ket “xwar û cardî ket”(T1), derin o divin “diherin û dibin”(T1).

Carinan gihaneka -ûyê wek -wyê jî tê bilêvkirin. Mînak: lê siwar dive’w tere “lê siwar dibe û dere/dihere”(T3)

2.1.1.9. Guherîna u > i: Gi “ku”(T1) di vê mînakê de em dibînin ku hem -k hem jî -u guherîye. Ji bo -kyê di guherîna dengdaran de dê mînak hatiye dayîn. Her wiha di beran “du beran”(T2), tine yi “tune ye”(T4) jî wek mînakên dîtir tê şîrovekirin.

2.1.2. Ketina Dengdêran: Di devoka Semsûrê de çawa ku tîp diguherin her wiha em dikarin behsa ketina tîpan jî bikin. Ziman di axaftinê de bi haletê sade an jî hêsantir tev digere. Lewra ji bo xwe kîjan siviktir be wê rewşê hildibijêre. Ji mînakên dê bê dîtin ku ketina tîpan ne pir zêde ye.

2.1.2.1. Ketina e yê: Carinan -eya li dawîya peyvê carinan jî ya li berîya tîpa -kyê dikeve.

Wek: Mês kiriyê “mêze kiriyê”(T1), qelişkî li wir vebû “qelişek li wir vebû”(T6), taximkî “taximekî”(T7)

2.1.2.2. Ketina ê yê: Biresera nerastexo ku piştî pêveberê tê di rewşa tewandî de ye. Rewşa xwe ya tewnadî jî li gor zayendê bi tîpa nêr be -î mê be -ê werdigire. Li gorî yekê di mînakên me de em vê qertafê dibînin ku ketiye.

Wek mînak: Va tê mal “eve(ev) tê malê”(T1), çûne mal “çûne malê”(T6).

2.1.2.3. Ketina i yê: Em di vê kategoriyê de zêdetir mînakên li ser ravekan dibînin: van kurkana “kurikana”(T7), lawkî me “lawikekî me”(T7), keçka xa “keçika xwe”(T7), va jinka “vê jinekê”(T7).

Tîpa -iyê dengêkî pir lawaz e. li hin herêman li gorî hêza xwe carinan tê bilêvkirin carinan jî dikeve. Kurdo(2013: 54) derheqê vî dengê de wiha dibêje: “Dengdêra -iyê (bizroke) li gorî wan dengên li pêş û paşên wî hene diguhere û di bilêvkirinê de ciyawaz e. dibe ku mîna her dengdêreke bêhêz be bilêvkirin. Peydabûn û jînavçûna wê li gorî rewşa fonetîkî ya hêz û taybetmendiya diyalekta bêjeyê ye. Û di xala dewama wê de wiha dewam dike: “Bizroke di nava kîteya girtî de bi guherîna hêzê jî nav diçe. Ev di wê demê de rû dide ku hêza dawî ya kîteyê digel qertafa hevbendiyê tekel dibe.”

2.1.2.4. Ketina î yê: Bera bin din “bera binî din”(T1). Di lêkera dine de ja layê morfosenstaksê jî taybetiyeke heye lê ji ber ku ne mijara me ye em nakevin navê. Tenê dibê bê gotin ku risteyên ku pêvebera wê bi lêkera dayînê hatiye rîstandin ev mînak li

ber çavan dikeve. Û qertafa tewangê ya hokera vê peveberê jî tê avêtin di vê devokê de.

2.1.3. Zêdebûne Dengdêran: Tenê du deng hatin tespîtîkirin. Mînakên wan li jêr in ku di stran û kilaman de jî tîrên pêşberî me.

2.1.3.1. Zêdebûna e û ê yê: Em çî di bikinê “Em çî dê bikin”(T1), hatime kuyê “hatime ku”(T2), dixunê “dixwin”(T5), em çîr kinê “em çîr bikinê”(T6), herinê(T6)

Goşt dane ber miyê ye “goşt dane ber miyê” (T5). Ev cure zêdetir di stran û klamên folklorîk de tîrên pêşberî me. Di axaftina vê herêmê de zahf li kar e. Di stranên gelêrî de jî bi vî awayî derbas dibe:

Mînak di strana Xumxumê de:

Xumxumê qîza keşe ye

Paşil tîjî xurme ye

Lawino werinê bi qase ye

Ha nîna Eyşo nîna(Kevirbirî, 2009: 112) Risteya sêyem wek heman mînakê dikare bê dîtîn.

Her wiha di vê dîrîkê de jî wiha derbas dibe:

Kaniya Hêlê li mêrgê ye

E xulam sê biskê sê ye

Berda li alîkî bê ye

Te ez kuştîm te ez helandîm

Te ez kirim duhnê çîre ye... (Mazî, 2014: 65)

Dîsa di risteya duyem, sêyem û pêncem de heman şêwe peyrêzî û enklîtika –eyê tîrên pêşberî me. Mîrov dikare gelek mînak di vegotinên gelêrî de tespît bike û bigihîje vî qenaetê ku devoka Semsûrê devokeke gelêrî ye gelêrbûna xwe parastîye.

2.2. Tîpên Dengdar/Consonant(Bêdeng/Nebizwên)

2.2.1. Guherîna Dengdaran

2.2.1.1. Guherîna b > v > w: Herfa -byê diguhere bi -vyê re. Mînak: hevûne “hebûne” (T1), divîn “dibîn”(T1), vê ke “dibê heke”(T2), xeverê b'mî de “xeberê bi min de”(T2), radive “radibe”(T3), dive “dibe”(T4), îcav nake “îcab nake”(T4), xeriv “xerib”(T6). Dema em bala xwe didinê -b zêdetir ku piştî -dyê tîrê vediguhere bi -vyê re.

Dengê -byê di peyva bîneyê de bi -wyê re diguhere: wîne “bîne”(T5)

2.2.1.2. Guherîna j > y > n: Tenê ji bo peyva rojê em dibînin ku carinan dewsa -j yê denge -y an -n dadigire. J bi xwe dikeve û tenê kok wek ro dimîne. Rohilat “rojhilat”(T7), roya di “roja din” (T1), rona dimrim “roja dimirim”(T3). Di mînaka avna xa “ava xwe” (T6) de jî –nyek heye lê me pê dernexist ku em wê çawa pêname bikin.

Dîsa di mînaka rojê de ji ber ku dengê -j ketiye qertafa nebinavkirî -ek bi dengdêra -o yê ve dibe yek heta -e jî bi xwe dikeve û tenê -k dimîne. Mînak: rok di(T3) an jî rokê “rojekê”(T4)

2.2.1.3. Guherîna k > g: Kêm caran be jî wek van mînakên li jêr em dikarin behsa guherîneke bi vî rengî bikin lê gumana me heye ku li hemû deverê Semsûrê bi vî rengî be.

Mînak:gi “ku”(T1), geçîkek “keçîkek”(T7)

2.2.1.4. Guherîna l > r: Ev reng guherîna di fonetîka kurdî de gelek berbelav e. Her wiha di Semsûrê de jî mînakên wê hene. Şûrê meke “şûlê meke”(T4). Ev peyv ji îstîxala erebî hatiye. Li hin herêman wek şexil, li hinan jî wek şuxul û şûl/şol jî tîrê bikaranîn. Riha nêzî Semsûrê ye lê li wir şol tîrê bilêvîkirin. Di heman demê de wateya kar û xebatê jî dihevine.

2.2.1.5. Guherîna w > v an v > w: Dîsa taybetiyeke hevpar e lê li Semsûrê jî ev taybetmendî li kar e. Lewma dibe mînak ji xebata me re jî. Vî gotiye “wî gotiye(T3) diwê “divê”(T3, T5), Rowiyê “reviyaye” (T6)

2.2.1.6. Guherîna z > s: V deng nêzî hev in lewra gelek caran dikevin dewsa hev. Ji tomarên me ev her du mînak ji bo wê dikare bê dayîn.

Mînak: Mês kiriye “mêze kiriye(T1), hes dikim “hez dikim”

2.2.2. Ketina Dengdaran: Li gor guherîna dengdaran ketina wan zêdetir e.

2.2.2.1. Ketina b yê: Birê çûk “birayê biçûk”(T1), dê “dibê/dibêje”(T1), dêne “dibêne/dibêjine”(T1), bime “bibime”(T3), çî dime xwarin “çî bidime xwarin”(T3), dê'k “dibê ku”(T4), dîne “dibîne”(T4)

Tê dîtîn ku di mînakên li jorê de dengê -b yê ya ku piştî -d yê tîrê bi taybet di lêkera gotinê de dikeve.

2.2.2.2. Ketina d yê: Di hin lêkera de qertafa dema niha dikeve. Bira pirs kin. “Bira pirs dîkin.”(T1), xwe çeq ke “xwe çeng dike”(T2), vê ke “dibê heke”(T2), vê'k va haqsîza “dibê ku van haqsîzan”(T5)

Di mînaka vê ke “dibê heke”(T2) de -d ketiye lê di hin cihan de dengê -d yê pir lawaz e. Serê zimên wek ku li diranên pêş ên jor nekeve tîrê bilêvîkirin. Di mînaka divê ku “dibe ku” de -d her bi vî şiklî tîrê gotin.

2.2.2.3. Ketina g yê: Ev deng zêdetir ku piştî-nyê bê -ng wek -nyê tîrê gotin. Tîpa -gyê giranî û hebûna xwe di nav -nyê de vedişêre. Wek: xwe çeq ke “xwe çeng dike”(T2), bojê kirine “bangê kirine”(T4)

2.2.2.4. Ketina h yê: -h jî dengêkî lawaz e. gi hilmeke sivik û qirikeke serbest telafûz dibe. Lewma jî ketina wê ji sivikbûnê ye. Lê ev deng di nav peyvê de be dikeve. Yanî li sere peyvê zûbizû wînda nabe. Heta carinan pey bi dengdêrekê re dest pê bike -h xwe li peyvê zêde dike. Mînakên wê di zêdebûna dengdaran de dê bîrê dayîn.

Mînak: Vê ke “dibe heke”(T2), nat “nehat”(T3), go daye ser “guh daye ser”(T4), dolê xistine “daholê xistine”(T6)

2.2.2.5. Ketina n yê: Qertafa kesandinê ya pirjimariyê -in di devoka Semsûrê de di hinek cihan de wek -î yê xwe nişan dide ku tîpa -n yê dikeve û tîpa -î yê jî dibe -î. Bipênî “bibînin”(T1), Her wiha jî bilî vê, mînakên bi vî rengî jî hene: Mi'j tiştîk nedî “Min jî tiştîk nedî”(T1), cardî çû şûnê xu “cardin(careke din) çû şûna xwe”(T1), şî va “şûn ve/va”(T1), mi “min”(T1)

2.2.2.6. Ketina r yê: Carinan jî tîpa -r yê dikeve. Wek mînak; henî “herinê”(T1) Esas di vir de -r yeke pir lawaz heye wek ku neyê bihistin. Li hin cihan xwe bi -eyeke dirêj jî nişan dide. Heme “herime”(T3), giî “gerek”(T4), weme destê te “werime destê te”(T10)

2.2.2.7. Ketina ş yê: Mînakên me ji bo vê babetê li ser cînavka -giş e. Gundî gi “gundî giş”(T2), gi kose nî “giş kose ne”(T3)

2.2.1.8. Ketina v yê: Peyva “meriv” wek kok “merî” tîrê bilêvîkirin. Ji ber vê yekê dema qertafa nebinavkirinê -ek lê zêde dibe tîpa kelijandinê -y dikeve navbera peyv û qertafa wê. Meriyek “merivek”(T3), te werê “tev were”(T12). Ji xwe -v meyla xwe li ser -wyê heye. -w jî tîpeke lawaz e. keysa xwe bibîne ji holê radibe.

2.2.2.9. Ketina w yê: Li mi ha ha kirin. “Li min wiha wiha kirin.”(T2), vexî “vexwî”(T5), lêre li wir e”(T9)

Xadî “xwedî”(T4), xa “xwe”(T4) di van mînan de dîftonga me dengê -w yê terk dike û -e ya piştî xwe diguherîne berev -a yê re. Xang “xweng”(T5), xa “xwe”(T5). Di her du mînan de mirov dikare bibêje ku -wya dîftongê bi -eyê re bi hev re diguherin.

2.2.2.10. Ketina z yê: E raketim. “Ez raketim” (T1), E rona dimirim “Ez roja dimirim”(T3), E l'mal tûne bûme “Ez li malê tune bûme”(T11). Ev mînak jî zêdetir di cînavka kesandinê ya yekjimar ya yekem de dixuyê.

2.2.3. Zêdebûna Dengdaran: Ji bo dengdaran jî em mînan li ser vê babetê kêm dibînin. Taybetiya zimanê e ku di telafûzê de peyv kêm dibin lê zêdebûn pir hindik e.

2.2.3.1. Zêdebûna h yê: Em tenê di anînê de li rastî vê zêdehiyê hatin ku ew jî dema ev lêker ku tîrê kişandin -aya wê dibe -o û -h jî li pêş -oyê li peyvê zêde dibe di hin cihan de. Asas -hya bi vî şiklî ku li pêşiya peyvên ku bi dengdêran dest pê dike, tenê ne taybetiya vê devokê ye lê ji ber ku di vê devokê de em di lêkera anînê de li rastî vê mînakê hatin wek nimûneyek jî vê herêmê me xwest li xebata xwe vê mînakê jî zêde bike. Honî “anî”(T1, T3, T4, T5) divê bê zanîn ku carna wek onî û

wonî jî telafûz dibe. Her wiha lêkera avêtinê jî carinan wek hovêtiye(T4,T5) tê bilêvkirin.

2.3. Taybetiyên Daçekî û Gihanekî

Ji bilî mînakên li jorê em dixwazin li ser çend tiştên din jî mînanan bidin. Çend guherînên din jî hene ku bi mijara daçek û gihanekan re têkildar e ji aliyê dengsaziyê ve. Li gorî ku hatiye tespîtîkirin paşdaçek di devoka Semsûrê de bi forma xwe yî klasîk maye. Yanî sê paşdaçekên me(-de, -re, -ve) bi awayê(-da, -ra, -va) telafûz dibe.

Berbang (1997: 42) jî bo vê xalê wiha dibêje: Xaleke girîng jî xurdepaşên daçekên /di...de/ji...re/bi...ve/ ne, li herêmê ev xurdepaş wekî “va, ra, da” tên bilêvkirin. Mînak:

Bi jin û mera **va** mîna qulî kêrguya.

Ya di zik **da** keçikê

Di parî dilî min **ra** darî tûyê

Ji qeydên me çend mînak li jêr hatine nivîsîn ku jî van qeydan hatine hîlbijartin; T1, T2, T3, T4, T5, T7)

Devoka Semsûrê

Şûn va
Bi ‘erdê da
Bi kêrekê va
Ku da

Forma nivîskî ya nû

şûn ve
bi ‘erdê de
bi kêrekê ve
bi ku de

Her wiha pêşdaçeka -ji nayê bikaranîn. Wek ku bi temamî ji ziman ketibe lê di dewsa wê de li hin ciyan -li tê bikaranîn. Lewra di hin lêkerên biwêjî de hebûna xwe parastîye: wek “hayjêbûn(hay **ji** wê bûn)” û “serjêkirin(ser **ji** wê kirin)”. Li gor Berbang ((1997: 42) nebûna daçeka -ji cudatiya herî berbiçav a vê devokê ye ku di cihê wê de daçe -li tê bikaranîn. Dîsa hat tespîtîkirin ku pêşdaçeka -bi jî carinan dikeve.

Devoka Semsûrê

Merî kose ra
Vir here
Lê hes kiriye

Forma nivîskî

ji mirovê kose re
ji vir here
jê hez kiriye

Ji bilî vana pêşdaçeka -ra di peyva berî xwe re dibe yek: paşê’r “ji paşa re”(T4), xa’r “ji xwe re”(T5), pîrê’r “ji pîrê re”(T4). Dikare bê gotin ev mînak zêdetir di peyva ku bi bazindaçeka (-ji ... -ra/re) re xwe nişan dide. Daçeka şert û mercê -heke jî tenê wek -keyê tê bilêvkirin: ke “heke”(T2), ke bikarim “heke bikarim”(T3, T4).

Heçî gihanek in ew jî bi guherînên bi vî rengî xwe nişan didin. Mesela gihaneka -ku carinan wek -ki ya ku bi dirêjkirin û vezelandina her du lêvan û bi paşderka ziman û qirikê der tê, telafûz dibe an jî bi -giyê dixuyê. Her wiha -û jî wek -oyê tê bilêvkirin. Carinan jî -ku bi peyva berî xwe ve dibe yek: mani’k “mana ku”(T2), vê’k va haqsîza “Dibê ku van haqsîzan”(T5).

Dîsa di hin cînavkan de Va (Ev cînavk me tam pê dernexist ku ji kîjan rewşê guheriye. Lewra jî wek jêrenotê çend tişt me divên bên gotin. Dibe ku ji tewanga “ev” ê guherîbe. Li hin ciyan wek eviya an jî viya yê derbas dibe. Dîsa formeke dîtir heye ku ev e; cînavk ev ê wek eve yê jî tê bikaranîn li herêmên mîna Badînan Botan. Dikare bê gotin bandora van herêman çiqas xurt e li ser devoka Semsûrê) tê mal “eve(ev) tê malê (T1), vana çûn “ev çûn”(T2).

3.ENCAM

- Hêza dengên lêvkî û qirikî pir lawaz e.
- Diftong (xw) di vê devokê de tune, di dewsa wê de tîpa (x) bi kar tê.
- Daçeka ji rabûye tenê di nav lêkerên biwêjî de maye. Di şûna ji yê le tê bikaranîn.
- Guherîna herî berbiçav ji dengdêran a > o, ji dengdaran jî b > v > w ye.
- Ketina dengên dengdar zêdetir e ji dengdêran.
- Paşdaçek bi forma klasîkan xwe parastîye.
- Guherîn û ketina tîpan zêdetir in ji zêdebûna tîpan.

4.ÇAVKANÎ

- Akdag, Z. (2017). “Dewlemendiyeke Zimanê Kurdî; Devoka Semsûrê” Kovara Zend, Bihar, Hejmar 25, 105-109.
- Ebdurehman Ehmed, M. (2017). “Çend diyardeyekî Fonolocî Le Nêwan Zarekurdîyeke û Zimanê Êraniyeke da” Kovarî Zankoy Raperîn, Adar, Hejmar 10, 9-25
- Bedirxan, C. A. û R. Lescot (2012). Kürtçe Gramer. İstanbul: Weşanxaneyê Avesta.
- Berbang, S. (1997). “Lêhûrbûneke Biçûk Li Ser Devoka Semsûrê” Kovara Zend, Payîz, Hejmar 3, 41-46.
- Kevirbirî, S. (2009). Sedsala Qêrînekê Karapetê Xaço. İstanbul: Weşanên Do.
- Kurdo, Q. (2013). Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî, İstanbul: Weşanxaneyê Nûbihar.
- Mazî, Ç. (2014). Baxek Ji Folklorê Kurdî, Ji Dêrdora Mêrdînê. İstanbul: Weşanên Berbang.
- Tan, S. (2015). Rêzimana Kurmancî. İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

4.1.Çavkaniyên Înternetê

- <http://www.adiyaman.gov.tr/adiyaman-tarihi> (25.12.2017)
- <http://www.adiyaman.gov.tr/nufus-bilgileri> (25.12.2017)

The Sound and Letter Changes of Semsur(Adiyaman) Mouth

Abstract:

This study aims to reveal the sound and letter changes of Semsur(Adiyaman) mouth. In this way, Semsur is trying to reveal the features of his mouth. Because Adiyaman geographically remains in Northern Kurdistan. This floating Kurdish (Kurmanji) speaks away from centers. Our work aims to identify the voices of Semsur and to reveal falling and changing voices. In this direction, some audio recordings were taken from Semsur. Later, the samples were identified for use in the study from these sound recordings. The samples obtained were classified in the alphabetical order as loud and silent. In this classification, the sounds falling, changing or added were given by examples respectively. Apart from this, some findings related to conjunctions and prepositions were discussed. We also talked about changes in some gender-based appendices. As a result of which Semsur's mouth was exposed to sound changes and differences. we are pleased to express our thanks to İslim Doğan, who has made great efforts in obtaining sound recordings in this study and at the same time our students.

Keywords: Sound, Phonetic, Mouth, Semsur's mouth.